


**qeşaçîya**

*Tu xwedaya qeşaçîyayî!*
*lûtkeya du cemseran*
*hukumdara sermaya ku ji şûrê tûjtir, ji dojehê erjengtir!*
*Çima rengê pîroze bi te ewqas pîroz e?*
*Çima biriqîna te ronahîya çavan kor dike?*
*Kapîtanê Tîtanîkê sucdar bû û rêya xwe winda kir, li te qelibî û tu jê ra bûyî goristan.*
*Baş e! Te çi ji evîndaran xwest?*
*Te Jack mîna xwe qerisand, ew noqê ava xwe kir.*
*Û te Rose êşand heta mirinê!*
*Bihele, ku şîfreyên evînê bipişkivin!*
*Bihilşe, ku kapîtan rêya xwe winda mekin!*

*E. Ararat*
*Hellersdorf, 14.12.2021*

**Der Eisberg**

*Du Göttin von Eisberg!*
*Der Gipfel von zwei Polen*
*Die Beherrscherin der Kälte, scharfer als das Schwert, fürchterlicher als die Hölle*
*Warum ist die Farbe türkis dir so heilig?*
*Warum blendet deine Leuchten das Licht der Augen?*
*Der Kapitan der Titanic war schuldig und hat sich verrit, er ist in dich gekracht und du bist ihm zum Friedhof geworden.*
*Gut! Was wolltest du von den Liebenden?*
*Du hast Jack eingefroren wie du selbst bist, und ihn in dein Wasser getaucht.*
*Und du hast Rose weh getan bis zu Sterben.*
*Schmelzt, dass die geheimen Schriften der Liebe blühen!*
*Zerfallt, dass die Kapitäne nicht! vom Weg abkommen!*

*E. Ararat*
*Hellersdorf, 14.12.2021*